

# PARTİYA SOSYALİST A KURDISTAN

(PSK)

## DI RÎYA AZADÎYÊ DE TEKOŞîNEKÎ BI RÛMET Û 50 SALÊN BÊNAVBER

Ji aktorêng ên qada siyasî ya tevgera azadixwaza Kurd ku ev zêdetirî 200 sal in li Rojhilata Navîn berdewam dike, ji wan yek jî Partiya Sosyalist a Kurdistanê (PSK) ye.

Partiya Sosyalist a Kurdistanê (PSK) îsal dibe 50 salî.

Welatê me Kurdistan, ji aliyê hêzên emperyalîst û dewletên kolonyalist ên herêmê li ser çar dewletan hat dabeş kirin. Bakurê Kurdistanê kû beşa herî mezin e, ji hêla hêzên dagirker ve di hemû waran de li gor pilan û bernameyên teybêt bi zanatî paşve hat hêştin. Li Bakûrê Kurdistanê di rewşekî kû pêvendîyên feodalî û pêkhateya eşîrî xurt e, 50 sal berdewamîya tekoşînekî bê navber ku îro jî berdewame gelek girîng e. Bi gotinekî din di nav van şert û mercên dijwar de PSK 50 sal e rojekê jî dev ji têkoşînê berneda. Ev berhema bernameya PSKê ye, siyaseta wê ya realîst, dînamîk û nûjen e ku rastiya welat û cîhanê li ber çavan digire û herweha fedakarî û xwe bexşana qadir, endam û dilxwazên wê ye.

PSK ji roja ku hatiye damezrandin heta niha ji têgihîştina dogmatîk dûr ma. Bername, stratejî û siyaseta xwe bi berçavgirtina li gor geşedanên gerdûnî û herêmî her tim xwe nûjen kir. Armanca vê broşûra di destê we de bi tevayî danaşîna PSK û guhertinên radîkal ên ku ji damezrandina wê heta niha li ber çavan were raxistin.

Di salêن 1960'î de li Bakurê Kurdistanê pêvajoya damezrandina partiyêن Kurdistanî yên îlegal ên xwedî nasnameyeke netewî ya demokratîk dest pê kir û têkoşîna di vî warî de berdewam kir. Hin ronakbîrên kurd ên çep, ku li derveyî van rêexistinêni siyasî mabûn û bi sosyalîstên tirk re di nav refêن Partiya Karkerêne Tirkîyê (TİP) de tekoşîn didan, van ronakbîran ji bo rizgariya neteweyî û cîh bicîh anîna sosyalîzmê di warê bîr û ramanan de di nav xwe de dest bi dan û sendinê kirin.

Ev nîqaş û lêgerîn piştî darbeya leşkerî ya 12ê Adarê, bi taybetî ji aliyê rewşenbîrên kurd ên li Zindana Leşkerî ya Diyarbekirê ve bi awayekî xurttir hat berdewamkirin û di vê serdemê de di nav sosyalîstên kurd de yekemîn kombûn dest pê kir. Sekreterê Giştî yê damezrîner ê PSK'ê Kemal Burkay, ku wê demê li sîrgûnê bû, bi broşûra ku bi navê "Têkoşîna Rizgariya Gelê Kurd di Şert û mercên Tirkîyê de" nîvîsand, van nîqaşan kûrtir kir. Nêrînê Burkay ji aliyê gelek komên din ve jî hatin qebûlkirin.

Di şeva 31ê Kanûnê de, ku sala 1974an bi sala 1975an ve girêdide, 7 rewşenbîrên kurd ên ku li Tirkîye û Bakurê Kurdistanê di têkoşîna demokrasî û rizgariya neteweyî de cih girtibûn di vê pêvajoya têkoşînê de hevûdu nas kirin û di wê baweriyê de bûn ku divê sosyalîstên kurd, ji çepê Tirkan û rêexistinêni wan cuda li ser esasê neteweyî cûda werin rêexistinkirin; Li ser vî esasî Kemal Burkay, Ziya Acar, Yılmaz Çamlıbel, Faruk Aras, Mehdi Zana, İhsan Aksoy û Veysel Çamlıbel bi awayekî îlegal Partiya Sosyalist a Kurdistana Tirkîyeyê (TKSP) bi navê wê yê kurdî Partiya Sosyalist a Kurdistana Tirkîye (PSKT) ava kirin. (Di Kongreya 3. de ya ku di sala 1992an de hat lidarxistin gotina "Tirkîye" ji navê partîyê hat rakirin, PSKTyê wek PSKê rêya xwe berdewam kir.)

Damezrandina partiyê wek illegal ne daxwaz û hilbijartinek bû, lê pêwîstiyek waqiyî bû. Ji ber ku di wê demê de karanîna peyva Kurd û Kurdistanê qedexe bû, heta avakirina partieneke bi navê Kurdistanê bi salan cezakirina wê hebû.

PSK wek partîyek Kurdistanî her weha armanca wê ya dawî avakirina sosyalîzmê ye li Kurdistanê. Lê di destpêkê de, ango di qonaxa ewil de PSKê azadiya neteweyî esas girti li ser vî esasî PSK hat damezrandin.

Şert û mercên siyasî yên neteweyî, herêmî û navneteweyî yên dema damezrandina wê, pêkhateya rôexistinî, bernameya siyasî û rôbaza têkoşînê ya PSKê diyar kirin.

Wextê ku PSK ava bû, geşadanêni siyasî, civakî û aborî yên li cîhana dupolar (cîhana du bendî) ku daxwazêni azadî, wekhevî û edaletê bi dengekî bilind dihatin qîrîn, ji aliyê DYE û Yekîtiya Sovyetê ve dihatin diyarkirin.

Li aliyekî qutba, ji emperyalîst û hevkarêni wan ên herêmî ve pêkhatibû, li aliyê din jî sîstema sosyalîst a bi pêşengiya Yekîtiya Sovyetê, têkoşîna çîna karker a li dijî kapîtalîzmê ji bo mafêni xwe yên aborî û siyasî, antî-emperyalîst -Têkoşîna rizgariya neteweyî ya gelêni bindest ên li Rojhilata Navîn, Asya Dûr, Afrîka û Amerîkaya Latîn bû.

Rojhilata Navîn ku welatê me Kurdistan jî li vê navçê ye, cihê nakokiyêni DYE û Yekîtiya Sovyetê bi kûrahî dihatin dîtin û cihê rûtîniya kaos û şerê navxweyî ye.

Ne tenê PSK, hemû rôexistin û partiyen Kurdistanî yên welatparêz di bin bandora vê nakokî û pêkhateya kaotik a Rojhilata Navîn de mabûn.

PSK di dema destnîşan kirina helwesta xwe ya siyasî de, bê îradeya gelê Kurd, parçekirina Kurdistanê li ser çar parçeyan ji aliyê emperyalîst û hevkarêni wan ên kolonyalîst vê rewşê her tim li ber çavan girt. Haya wê ji encamêni siyasî, civakî û çandî yên dabeşkirina navborî hebû.

Belê Kurdistan yek welat e û kurd jî yek gel in. Lê di encama parçebûnê de û li gorî pêkhateya dewletêni serwer, her parçeyek pêşketinêni civakî, siyasî û çandî yên taybet bi wê beşê re rû bi rû maye. Têkoşîna rizgariya netewî li her parçeyekî şêweyêni cuda girt û pêkhateyêni cuda yên siyasî derketin holê.

PSKê ji destpêkê ve pêkhateya Kurdistanê ya perçebûyî û encamêni wê li ber çavan girt. PSKê li hemû Kurdistanê hizra yek partieneke siyasî û yek tevgereke netewî maqlî nedît û nabîne. Tekez kir ku tevgera azadiyê li her parçeyekî wê li gorî şert û mercen xwe rîgezê bisopîne. Li dijî destwerdana di karûbarêni navxweyî yên parçeyan û tevgerêni rizgarîwaz ên neteweyî yên her parçeyan bû û daxwaza hevgirtina parçeyan pêş azadîya parçeyan fikir û remanekî resteqînî nedît.

PSK di wê baweriyê de bû û di wê baweriyê de ye ku kongreya netewî ku hemû pêkhateyêni siyasî yên Kurdistanê di nav de bin, pêwîst dit û pevist dibîne. Partiya me ji salêni 1980yî heta niha bi vê armancê di nava hemû pêngavan de ye. Mixabin ji ber aloziyêni di navbera hin rôexistinan, destwerdana dewletêni kolonyalîst û derketina geşadanêni girîngitir ên wek Raperîn û dûv re jî birakujiyê ev hewldan bi ser neketin. Lê ev pêwîstî iro jî heye. PSK di wê baweriyê de ye ku divê mijarê de bi lez tevnegerin û gav bi gav bimeşin.

PSK ku armanca wê ya sereke ev e, li Bakurê Kurdistanê rizgariya neteweyî û civakek li ser bingehê wekheviyê ava bike, her dem bi erkên xwe yên li hember parçeyên din haydar bûye, bi rêxistinê Kurdistanî yên welatparêz re têkiliyê biratiyê ava kiriye û piştgiriya xwe ji têkoşînê rizgariya neteweyî re pêşkêş kiriye.

Xebat û destkeftiyê partiya me di vî warî de ji bo me cihê şanaziyê ye.

### Taybetmendiyê PSKê

PSK Partîyekî Kurdistanî ye, berî her tiştî ji bo ku gelê Kurd çarenivsa xwe bigre destê xwe û bi destê xwe biryarê bide ku li welatê xwe çawa bijî têdikoşe, ango PSK ji bo ku Kurd bibin dewlet tekoşîn dide.

Avakirina dewletê, wek hemû gelên din, mafê Gelê Kurd jî heye ku dewleta xwe ava bike. Ev mafa nayê nîqaşkirin.

Gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê bi du awayan dikare çarenûsa xwe destnîşan bike. Avayê yekem; dewleteke serbixwe ye, ya duduyan jî, bi tirkan re yekîtiyeke demokratîk avakirin e.

PSK di wê baweriyê da ye û vê diparêze ku ev yekîtî wê bi avakirina avahîyeke federatîf a bi du komarênen xwedî mafêne wekhev pêk were. Yanî Kurd di her warî de bi Tirkan re bibin xwedî mafêne wekhev.

PSK di wê baweriyê de ye ku gelê Kurd bi têkoşîna rizgariya netewî dikare bigihêje azadiyê. Ji ber vê yekê jî PSKê bernameya xwe li ser vê têgihiştinê ava kiriye. Bernama PSKê bernameyekî realist e. PSK di wê baweriyê de ye ku ji bilî tekoşîna rizgariyê ya bi biryar, pêwîstî bi stratejiyek û têgihiştineke wisa heye. Bernama PSKê li gor şert û mercen welat û herêmê hatîye destnîşan kîrin û li gorî rastiyêne rewşa Kurdistanê ye.

Partiya me ji bo çareseriya pirsgirêka kurd li Tirkîyê, formula federasyonê pêşniyar dike. Ev formul ji ber rewşa navneteweyî û şert û mercen Rojhilata Navîn, Tirkîye û Kurdistanê li ber çav hatîye girtin. Federasyonek li ser esasen wekhevîyê, cîh bi cîh bûna hemû mafêne siyasî yên ku Tirk jê îstîfade dîkin, divê gelê kurd jî heman xwedî wan mafan bin daxwaz dike. Divê li Bakurê Kurdistanê parlamento û hikûmeteke ku îradeya gelê Kurd temsil bike pêk were.

Di destpêkê de gelek rêxistinê welatparêz ên Bakurê Kurdistanê li dijî têza federasyonê ya ku me ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd pêşniyar kiribû, bûn. Me bi hevalbendên Tirkan, reformist û hwd tawanbar kîrin. Lê PSK bi biryar li ser vê pêşniyara xwe rawestiya û di her platformê de parast. Em xweşhal in ku iro piraniya rêxistinê kurdên Bakur li ser federasyonê li hev dîkin. Partiya me di pêşniyara çareseriya pirsa kurd û Kurdistanê li ser esasê federasyonê de hemfîkrîya tevgera welatparêz a Kurd de xwedî kedek mezîn e û ev ji bo me cihê şanaziyê ye.

PSK partîyekî azadîxwaz, welatparêz, demokrat û sosyalîst e. PSK Partîya kedkarên Kurdistanê, çîna navîn, qatêن kêm-dahat û qels, rewşenbiran û hemû beşen alîgirê demokrasî, azadî û wekheviyê ye. Ji bo maf û azadiyêne bingehîn ên hemû pêkhateyê etnîkî û olî yên li Kurdistanê dijîn têdikoşe. PSK bi vê hişmendiyê tevdigere ku pirsgirêka Kurd pirsgirêkek neteweyî ye ku hemû qatên gelê Kurd dihewîne, ne tenê beşek ji civaka me.

### Yekîtiya Netewî û PSK

PSK, Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd, li ser bingeha daxwazên hevpar ên neteweyî hevkariya hemû hêz û komên welatparêz weke av û hewa pêwîst dibîne.

Ev yek, yanî misogerkirina yekîtiya hêzên welatparêz, her tim di rojeva me ya siyasî de cih girtiye. Partiya me ku di vî warî de bi xurtî kar û xebat kirîye pratîkeke me ya dewlemend heye ku em pê serbilind in. Ji ber ku li Bakurê Kurdistanê ti hewldan û xebata bo yekitî û hevkarîya hêzên welatparêz ên Kurdistanê nîne ku PSK ne di nav da be.

Vê pêvajoyê hîn beriya 12ê Îlonê ji alîyê PSK, DDKD û KUKÊ ve bi damezrandina Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk (UDG) dest pê kir. Bi xebatê HEVKARÎ yên di navbera salê 1981-1984'an de ji alîyê 5 rêexistinê welatparêz ve bi hev re hatin meşandin, dewam kir.

PSK di sala 1988an de bi 8 partî û pêkhateyên welatparêz re Rêexistina Rizgariya Bakurê Kurdistanê (TEVGER) damezirand.

Yek gavekê wêrek ku bû sedema encamên girîng jî ew bû ku di Adara 1993an de PSKê bi PKKê re protokolek îmze kir.

Protokola îmzekirî ya PSK-PKKê bû sedem ku di navbera hêzên welatparêz û PKKê de kêseyên ku ji PKKê derketine kêm bibe. Di vê pêvajoyê de 12 rêexistin û pêkhateyên siyasî yên Bakurê Kurdistanê ku PKK jî di nav de bû, bi armanca avakirina enîyeke netewî dest bi xebatê kirin.

Her çiqas xebata pêkanîna eniyê ji ber helwesta hegemonîk û bi hêz a PKKê têk çû, lê berdewamîya vê xebatê, partiyêne Kurd di sala 1995an de Platforma Rêexistinê Kurd ava kirin. Platformê di sala 1999an de navê xwe guhert û kir Platforma Neteweyî ya Bakurê Kurdistanê (PNK-Bakur)

Di heman serdemê de, di encama hewldanê bi biryar û israr ên partiya me, Koordînasyona Rêexistinê Demokratîk ên Kurdên Ewropayê (DEM KURD) ku di nav de KOMKAR û rêexistinê bi vî rengî yên li Ewropayê kar dikan, hat avakirin. Piştî vê yekê, Platforma Kurdên Ewropayê (PLATFORMA) ku ji Înîsiyatîfê DEM-KURD û PNK-Bakur pêk tê, ji aliyê rewşenbîrên li welatêna cuda yên Ewropayê dijîn ve hat avakirin.

### Têkoşîna Demokratîk a Legal û PSK

Partiya me ku ji ber sedemên zarurî bi awayekî ilegal hatibu damezrandin, ti carî ilegalîtê nekir taca serî. PSKê bi aliyêne neyînî (negatif) ên têkoşîna ilegal û aliyêne erênî (pozîtîf) yên têkoşîna legal haydar bû. Ji ber vê yekê girîngîyekî teybet da vê şêwaza têkoşînê. Li hêla din ji bo ku PSK bi nav û bernameya xwe di qada siyasî de têkoşîna xwe wek legal û fermî bidomîne her tim di nava armancêne me da bu.

Partiya me ne tenê di qada siyasî de, di warê xebatêna çandî, çapemenî, civaka demokratîk û sivîl de jî, ji mafêne heyî yên demokratîk sûd wergirt, her weha PSKê ji bo pêşxistina têkoşîna neteweyî a demokratîk derfetêne wan deman, şert û mercêne serdemê baş bikar anî.

PSK girîngîya çapemeniyê, di hişyarkirina raya giştî, birêexistinkirin û li dar xistina çalakiyan, li ber çav girt, di vî warî de qada demokratîk a heyî ji bo hişyarkirin û birêexistinkirina gelê Kurd bikar anî. Li ser pirsgirêka kurd xebatêna weşangeriyê meşand. Kovar û rojname derdixistin ku ji bo hişyarbûna raya

giştî ya li ser rewşa pêvendîyên aborî, statuya siyasî û dîroka Kurdistanê û ji bo naskirin û pêşxistina çanda kurdî de bandorekî girîng kirin.

Kovara Özgür Yolu ya mehane ya ku me di Hezîrana 1975an de dest bi weşana wê kiribû, rojnameya Roja Welat a 15 rojî bi kurdî-tirkî ya ku me di sala 1977an de derxistibû û rojnameya Azadiyê ya ku me di bin şert û mercenî idara urfî de beriya 12ê Îlonê derxistibû, rolekî pêşengî di vî warî de leyistin. Hema hema weke dibistanekê kar dikirin.

Van weşanên bi nav kirî; ne tenê bûn alîkarê hişyarîya gel, belavbûn û bilind bûna hestê çînî û neteweyî, ronahîya çanda kurdî, pêşketina xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî, di heman demê de bala raya giştî ya Tirkiyeyê kişand ser statuya siyasî ya Kurdistanê, pêkhateya kolonyalizmê hwd. wan weşanan di derbarê pirsgirêkan û rîya çareserîya wan de agahdar kirin. Mijaran xasma jî mijara Kurd û Kurdistanê bi derdorêni siyasî yên çepêni tirk re nîqas û gengeşî kirin.

Her çiqas di serdema cunta faşîst a 12ê Îlonê de pêvajoya weşana kovara Riya Azadiyê hat qutkirin jî, PSKê demek şünde wê wek bûltena Komîteya Navendî ya Partiyê, bi navê kurdî weşana kovara Riya Azadî berdewam kir. Riya Azadî heta Hezîrana 1991ê 139 hejmar derket.

Kovara Deng di şert û mercenî guherîna Tirkiyeyê de mîsyona kovara Riya Azadiyê girt ser xwe û hejmara wê ya yekemîn di Kanûna 1989an de derket. Kovara Deng îro jî weşana xwe didomîne.

Ji bilî Kovara Dengê, rojnameyên hefteyî, yên wekî Azadî, Dengê Azadî, Ronahî, Hêvî, Roja Teze, Dema Nû ku ji salên 90î de derketin di têkoşîna çapemenî û weşangeriyê ya Kurd de şopeke girîng hiştin.

Weşanên Deng bi sedan berhem çap kirine, ku di nav wan de klasîkên kurdî, lêkolînên li ser pirsgirêka kurd, dîrok û wêjeya kurdî hene.

PSK ne tenê bi çareseriya pirsgirêka Kurd re mijûl bû. Di heman demê de li Tirkiyeyê di têkoşîna demokrasiyê û têkoşîna çîna karkeran a maf û azadiyê de cih girt. Endam û qadroyên PSKê di rêxistin û rêvebirîna sendîkan, rêxistinê girseyî yên demokratîk û rêxistinê pîşeyî yên ku vê têkoşînê dimeşandin de cih girtin.

TÖB-DER ku rêxistina mamosteyan a herî bi hêz a serdemê bû, qadir û endamên PSKê hem di rêvebirîya şax û hem jî di rêvebirîya navendîya wê de cih girtin. Her weha PSKî di nav saziya DîSK, TÜM-DER û saziya kedkarên tenduristiyê TÜS-DER de jî xwedî bandor bûn.

TÖB-DER Rêxistina mamosteyan a wê demê bû kû 200 hezar endamê wê hebûn.

Di encama xebatêni xurt ên PSKê, TÖB-DERê Kongreya Perwerdeya Demokratîk li darxist. Di wê kongre de biryara "perwerdeya neteweyî di naverokê de bi awayekî demokratîk" hat girtin. Ev biryar di heman demê de tê wateya mafê perwerdehiya bi zimanê kurdî jî. Wê biryara girîng ji aliyê DîSK, Yekîtiya Nivîskarêni Tirk û Malêni Gel û ji aliyê nêzî 40 rêxistinê demokratîk ên bi bandor û bi hêz a wê serdemê piştgirî lê hat kirin.

Partiya me hilbijartinêni herêmî û giştî yên li Tirkiyeyê ku pêk hatin weke platformeke tekoşînê dit, wê platformê wek fersend bi kar anî û daxwazêni gelê Kurd anî ziman.

Di salên 1970yan de li dijî nîjatperestî û zilma faşîst li kêleka hêzên demokrasiyê cih girt û li gorî şert û mercenî rojê helwestek realist diyar kir.

PSK, ku giringiyê dide bihêzkirina rêveberiyên herêmî, girîngiyek mezin da hilbijartinê şaredariyan ên li Bakurê Kurdistanê; bi destnîşankirina namzedênen serbixwe wek terefek di qada hilbijartina de cîh girt.

Di hilbijarinêna sala 1977an de Şaredariya Diyarbekirê, di sala 1979an de jî Şaredariya Agiriyê wergirt. Ev serkeftin ne tenê li Bakurê Kurdistanê, li Tirkîyê jî yekem car bû.

PSKê girîngîya dezgehê demokratik ên legal di warê pêvendîyên bi civatê re û bo rêexistinkirina civatê gelek giring dinirxîne. Ji ber vê yekê, di warê rola ciwanan û potansîyela enerjîya ciwanan di tekoşîna azadîya Kurdistanê de li ber çav girt û di vê warî de gavêن girîng avêt.

PSKê bi vê têgihiştinê li 22 parêzgeh û navçeyên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê, bi taybetî li Amed, Wan, Agirî, Bedlîs, Sêrt, Çewlik, Colemêrg, Stenbol, Enqere, Îzmîr, pêşengiya avakirina Komeleyên Çanda Gel ên Şoreşger (DHKD) kir.

DHKDyên ku di demeke kin de di nav xwendekar, karker û ciwanêñ gundî de belav bûn, ne tenê saziyên perwerdehiyê bûn ku kadroyên PSKê lê dihatin perwerdekirin. Endamên DHKDê ne tenê di xebatêñ PSKê de pêşeng bûn, di têkoşîna demokratîk a legal de cih girtin. Bûn parçeyek ji têkoşîna li dijî mêtingehiya neteweyî, zulm, buhabûn, xizanî û gendeliyê.

Li gel xebatêñ xwe yên di qada siyasî de, DHKDyan di warê çand û hunerê de xebatêñ girîng meşandin. Komên şano û muzîkê di nava DHKDyan de hatin avakirin, bi van xebatan ji pêşxistina çanda Kurdî re xizmet kirin. Barê çandî yên şevêñ çandî û siyasî yên wê demê li ser milê DHKDyan bû. DHKDî xwedî wê rûmetê ne ku li Bakurê Kurdistanê û Rojavayê Tirkîyeyê yekemîn Newroza girseyî pîroz bikin.

Di salêñ 1990î de bi pêşengiya kadroyên PSKê Komeleyên Çandî yên Gel (HKD) ku li gelek parêzgeh û navçeyan bi taybetî li Amed û Stenbolê hatin avakirin, di şert û mercên nû de têkoşîna DHKDê meşandin; Kevneşöpiya DHKDê zindî hiştin.

Têkoşîna ku ji aliyê HKDyan ve hat meşandin, bi rêya Navenda Çandê ya Stran a Stenbolê û Komeleyên ÇIRA yên li Amed û Agiriyê, qonaxeke nû girt. Kovara Govendê ya ku li Amedê derdiket, di warê çand û wêjeyê de heyecaneke nû afirand.

### **Qada Siyasî a legal û PSK**

Bi kêmbûna nisbî ya serdema faşîzma 12ê Îlonê û guhertina şert û mercên siyasî yên li cîhanê û Tirkîyeyê, PSKê avakirina partîyeke legal û demokratîk ku Tirk û Kurd jî di nav de cîh bigrin anî rojevê.

Sekreterê Giştî yê damezrîner Kemal Burkay, yekem car bi gotareke ku di kovara Dengê de hat weşandin vê mijarê anî rojevê. Di vê gotarê de vê fikir û pêşnîyara avakirina partîyeke legal xist rojeva siyasî ya Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê. Di destpêkê de hîn alî û der û dorêñ enîya kurd vê pêşnîyarê "aşitîparêzî, teslimîyetî, parlamentperestî, hiştina çareserkirina pirsgirêka kurd ji bo rehma meclîsa tirk" û hwd tawanbar kirin. Ev nêrîna ku bû hedefa rexneyêñ nerewa û bêbingeh, bi demê re di encama helwesta bibiryar a Partiya me, bû nêrîna hevpar a beşîn welatparêz ên berfireh.

Piştî nîqaş û dayin û sendin di nav hêz û alîyên welatparêz û çepê Tirk, xebatêñ avakirina partîyeke legal hat rojevê. Berhemâ xebatêñ di vî warî de hatin kirin, Partiya Kedê ya Gel (HEP) bû ku di sala 1990î de hat avakirin.

HEP di demeke kin de bi beşdariya rewşenbîrên kurd ên xwedî tecrûbe, zana û xwedî nêrînêna cuda, bû populer.

HEP ji ber helwesta hegemonîk a PKKê nekarî demeke dirêj bidome û hat hilweşandin.

Piştî HEPê Partiya Demokrasiyê (DEP) ku di sala 1993an de hat avakirin. DEPê jî aqîbeta çarenûsa HEPê serda hat, ew jî bû qurbana nêzîkatiyêni siyasî yên totalîter, yekdestdar û hegemonîk.

Piştî DEPê Partiya Demokrasî û Guherînê (DDP), Partiya Demokrasî û Aştiyê (DBP) û Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) hatin damezrandin. DDP û BDP herdu partî bi giranî ji hêla kadroyê PSKê hatin avakirin. HAK-PAR wek partîyekî sîwan bi tevî endam û qadrê PSKê û her wiha kesêni ji gelek rôexistinêne Kurdistanê û şexsîyenê welatparêz vê hat damezrandin.

PSK di damezrandin û xebata Weqfa Çand û Lêkolînê ya Kurdî (KÜRT-KAV) de ku li Tirkîyeyê di vî warî de yekemîn bû, bi awayekî aktîf cih girt. KÜRT-KAVa ku ji aliyê welatparêzêne Kurd ve hatiye avakirin û xebatêngirîng dane meşandin, iro jî hebûn û xebatêngane didomîne.

### **Prensîba Me Ya Herî Girîng; Demokrasiya Nav Partîyê**

Di têkoşîna ilegalîteyê de mijara herî girîng parastina pêkhateya rôexistinî ye. Ji ber vê yekê mijara demokrasiya di nava rôexistinê û bi awayekî demokratîk biryar girtin tê bingoh kirin. Ji aliyê din ve, her çiqas PSK partîyeke ku bi awayekî ilegal hatibû damezrandin û di rewşekî ilegal salêna dirêj têkoşin dabe jî, di kar û xebatêngane yê navxweyî û biryargirtinê de bi qasî ku ji dest dihat bi awayekî demokratîk tevgeriya.

Partiya me li gorî biryarêne kongreyêng xwe û li gor bendê destura partîyê hat birêvebirin. Biryarêne ku bi tevlêbûneke berfireh ji bingehê hatin girtin, ji serî heta binî di çarçoveya hiyerarşîk de hatin bicihanîn. Rêbaza nîqaşê û azadiya rexneyî bûne nirxêne me yêne sereke.

Ji ber vê yekê Kongreya 3. a PSK'ê ya ku di sala 1992'an de hat lidarxistin, di dîroka Partîya me de qonaxeke girîng e. Di kongreya 3. de di navê partiya me peyva "Türkiye" hat rakirin û kurtenavê partîyê ji PSKTê bû PSK. Ji aliyê din ve, piştî hilweşîna Sovyetê û hilweşîna sosyalîzma reel a sala 1989an, di kongreya 3. ya PSKê de, di bernameya partiya me de, derbarê sosyalîzmê de guhertinê radikal hatin kirin. Di bernameya partiya me de teza "dîktatoriya proletaryayê" hat terikandin û avakirina sosyalîzma aştiyane û demokratîk hat pejrandin.

Di bernameya partîyê de van hemû guhertinêng ên ku hatine kirin, di demêna cuda de di konferansên Partiyê yên li derveyî welat û li baregehê partîyê yên li nav welêt hatin nîqaşkirin û nirxandin, paş jî di kongre de hatin pêjrandin.

PSK di vê pêvajoya 40 salêna ilegal de 10 kongreyan li darxist. Di coxrafya me de ev serkeftinek nedîtî ye. Ji sedemêna ku me heta iro li ber xwe daye û têkoşîna xwe bênavber domandiye yek jê ewe kû em li gorî prensîba navendîparêzîya demokratîk tevgerîyan û heta ku ji destê me hat me demokrasiya navxweyî ya partîyê meşand.

### **Têkoşîna Demokrasiyê û PSK**

Yên Pirsgirêka Kurd li Tirkîye afrandîye ne partî û siyaseta partiyênu ku bûne desthilatdar. Belkû bingehê vê sîyasetê; a ku li ser senteza a ser Tirk - îslamê hatîye ava kirin û li ser hîmê yek dewletîyê şikil girtîyê ye. Ji ber vê sedemê jî guhurîna hikûmetan ji pirsgirêka Kurd re çare ne bûn û nabe jî.

Yê ku pirsgirêka kurd diafirîne, dewleta kolonyalîst a Tirk bi xwe ye. Lê şêwaza rêvebirina dewletê di diyarkirina rîya ku tevgera neteweyî ya kurd ji bo rizgariyê dişopîne bi bandor e.

PSK partîyekî bi demokrasiyê bawer e û girîngî dide têkoşîna demokrasiyê. PSK di wê baweriyê de ye ku demokrasî çareseriya aştiyane ya pirsgirêka kurd hêsanter dike.

Hevalê me yê hêja, şehîd Dr. Qasimlo ku me her dem bala xwe dayê gotin û şîretên wî digot; "demokrasiya herî xerab ji dîktatoriya herî baş çêtir e".

PSK girîngiyê dide peyvendîya di navbera têkoşîna rizgariya neteweyî ya Bakurê Kurdistanê û têkoşîna demokrasî û guhertinê ya gelên Tirkîyeyê.

Ji bo vê jî PSK; Ji damezrandina xwe heta niha di têkoşîna demokrasiyê ya li Tirkîyeyê de cih girtiye û di hilbijartinan de li dijî nîjatperestî û faşîstan di refê alîgirên demokrasiyê de cîh girtîye.

Partîya me, ji bo ku Tirkîyê şert û mercen Yekîtiya Evropa bi cîh bîne û bikeve nav YEyê piştgirîya xwe derbirî. Ji ber ku Yekîtiya Ewrupa, dê bibe alîkar bo demokratîkbûna Tirkîyê.

Di salêñ ewil ên desthilatdariya AKP de me piştgirî da gavêñ AK Partiyê yên ji bo demokrasiyê;

Her weha me piştgirî da referandumêñ ku ji bo guhertinêñ di Destûra Bingehînde hatin kirin. Em di wê baweriyê da bûn ku wan guhartinan dê di pergala monîst û kemalîst de qulekê çêbike û bi diyalogê alîkariya çareseriya aştiyane ya pirsgirêka kurd bikrana.

Partîya me gelek caran serdana hêzên demokrasiyê yên Tirkîyê kir, di wan serdanan de pirsa kurd û riya çareserîyê bi wan re da nasin, her weha ji bo projen xwe re piştgirî peyda bike bi wan hêzên demokratîk û alîgirên demokrasîyê re di nav têkilîyê da bû.

Di van têkilîyan de her tim bi bîr dixistin ku heta pirsa kurd li ser esasê rîbazên aşitîyane çareser nebe, aşitî û aramî li Tirkîyê jî peyda nabe.

### Sîyaseta Me Ya Navneteweyî

Aştî, maf û azadiyêñ mîrovayî, parastina mafêñ kêmnetewan, edaleta civakî û parastina siruştî û xwezayî nirxêñ hevpar ên hemû mirovahiyê ne. PSK ku di têkoşîna xwe de van nirxan wek nirxê xwe dibîne, di asta navneteweyî de jî parçeyek ji têkoşîna van nirxan e û hêzên di vê têkoşînê de weke dost dibîne.

Pirsgirêka Kurd ne tenê pirsgirêkek herêmî ye û di navbera dewletêñ kolonyalîst û gelê me de ye, di heman demê de pirsgirêkek navdewletî ye. Bi taybetî DYB, YE, Rûsyâ û hêzên din ên mezin jî di pirsgirêka Kurd de xwedî belwest û teref in. Ji bo fetsandina têkoşîna neteweyî ya demokratîk a gelê Kurd her tim piştgirîya dewletêñ dagirkerêñ Kurdistanê kirine, bi hev re tevgeriyane, hevkarî kirine û peyman çêkirine.

Li aliyê din hêzên mezin heta van demêن dawî li kêleka dewletê kolonyalîst cih girtin û di warê leşkerî, aborî û siyasî de alîkar bûn ku pirsgirêka kurd bê çareserî bimîne.

Rojhilata Navîn, ku cîhê nakokî û şer û pevçûnên navxweyî ye ku îro jî berdewame, her weha bûye qada şerê hêzên mezin ji bo avakirina hegemonyaya wan.

Ev jî dest nîşa dike ku li Rojhilata Navîn heta Pirsgirêka Kurd hel nebe û gelê Kurd negîhîje mafênetewî yên demokratîk li herêmê jî aştî û istîkar peyda nabe. Ji ber ku pirsgirêka Kurd li herêmê çar dewletan eleqedar dike, çareserî di rîya şîdetê de tê dîtin, ev jî bûye sedemeka sereke ya bê istîkarîya Rojhilata Navîn.

Sîyaseta PSKê bi li berçavgirtina şert û mercêن Kurdistan û Rojhilata Navîn û geşedanê navnetewî diyar dibe. Dizane ku têkiliyên baş bi hêzên aştîwaz, pêşverû û demokrat ên herêmê re, ji bo serkeftina têkoşîna rizgariya netewî pêwîst e.

PSK di wê baweriyê de ye ku gelên ku li Rojhilata Navîn dijîn dostêن hev in û di çarçova têkiliyên cîrantiyê yên li ser esasê berjewendiyên hevpar de, dikarin di jîngeheke azad de, di nav aramî û ewlehiyê de bijîn.

PSK dizane ku nakokî û lihevkirinê ku di asta navneteweyî de diqewimin bandoreke kûr li têkoşîna rizgariya netewî ya Kurd dikan. Ji ber vê sedemê, ji bo berjewendiya gelê Kurd li gorî guhertinê li ser asta cîhanê û pêvajoya globalbûnê de gavan davêje û hewil dide ku bayê navneteweyî li pişt wê be, ne li dijî wê.

PSK, ku ji bo serketinê, bidestxistina dostan ji bo doza netewî ya Kurd, her wiha li pişt me bayê guhertinê yên navneteweyî pir girîng dinirxîne. Bi baweriya gotina "hezar dost hindik e, dijminek pir e" ku bi meselokeke ûrânî hatiye gotin, Ji ber vê PSK ji bo doza kurd û Kurdistanê girîngîkî mezin dide peyda kirina dosta qada navneteweyî.

PSK partyeke ku doza aştiyê li herêmê û cîhanê diparêze û bo aşîtiyê têdikoşe.

Ji ber ku em kurd ku welatê me di bin nîrê dagîrkeriyê de ye, dewlemendiyê me têن talankirin, daxwazêن me ên ji bo heq û mafan bi zulm û şîdetê têن bersivandin, mexdûrên şerê neheq û qirêj ê dewletê ne, ji bo ku di nav aramî û ewlehiyê de bijîn, herî zêde em yanî gelê Kurd hewcedarê aştiyê ye. Ji ber vê yekê em di wê baweriyê de ne ku têkoşîna aştiyê parçeyek bingehîn a têkoşîna azadiyê ye.

### **Ji Bo Çareserîya Aşîtiyane Em Bi Israr in**

Gelê Kurd bi dehan salan e ji bo mafênetewî yên netewî û demokratîk têdikoşe û her tim alîgirê çareserîya aşîtiyane ya pirsgirêka Kurd bûye. Gelê me herdem daxwazêن xwe bi awayekî aşîtiyane anî ziman.

Her çiqas dagirkiran bi zêrandin û zêdekirina tundî û zordarîyê bersiva daxwazêن gelê me da jî, gelê me tu carî dev ji doza xwe ya pîroz û mafdar berneda.

Dewletên kedxar û xwînmij ji bo fetsandin û ji navbirina daxwazêن mafênetewî me, jibo hebûna xwe ya li welatê me bidomînin serî li karanîna çekan dan, cîhad ïlan kirin û şerîn qirêj û gemar meşandin.

Gelê Kurd jî jibo parastina xwe û welatê xwe neçar ma dest bi şerê çekdarî kir. Ev şer ku sipartin gelê me û li ser gelê me hatibû ferzkinir êdî lê dûrketina wê jî zor û zehmet bû. Îro şer li ser gelê Kurd tê ferzkinir. Berxwedana gelê me ya li dijî vî şerê qirêj û gemar mafekî rewa ye.

Li gel van hemûyan jî PSKê pêşketinên navneteweyî û rewşa herêmê, Tirkîye û Kurdistanê berçavan ra derbaskir û çareseriya aştiyane ya pirsgirêka Kurd pêşniyar kir û bibiryar parast.

Jiber ku têkiliyên navneteweyî yên Tirkîyeyê, endamtîya NATO û hewldanên endamtîya Yêkîtîya Ewropayê şansê serkeftina şerê çekdarî li Bakûrê Kurdistanê ji holê rakirîye.

Têkoşîna çekdarî ya ku ji sala 1984an û vir ve ji alîyê PKKê ve tê meşandin, ji feydeyê zêdetir zerar daye gelê Kurd. Atmosfera şer û pevçûnê jibo gelek operasyon û êrîşen dewleta Tirk ne tenê li Bakûr, li Başûrê Kurdistanê jî weke hincet û bahane tê bikaranîn.

### Dîyaspora û PSK

Mijara pirsgirêka Kurd ku heman demê de mijara qada navneteweyî ye û di vir de DYA, Ewropa û hêzên din ên mezin terefêن wê ne, ji ber vê sedemê jî giringîya dîasporayê ji bo tekoşîna gelê me qadekî gelek mezin e. Guhartinên siyasî yên li Rojhilata Navîn, ku welatê me jî beşeke wê ye, encama dînamîkên derve û yên navxweyîn e. Vê rastîyê jî dide xuya kirin ku dîaspora çiqasî girîng e.

PSKê bi vê rastiyê girîngî daye kar û xebatêن dîasporayê, li dîasporayê ji bo ku avahîyekî mayînde ava bike têkoşiyaye.

Dîroka dîasporaya Kurdan xwe naspêre salêن dûr û dirêj û ne pir kevn e. Di salêن 1950an de hejmara Kurdêن ku jibo xwendinê û doktorayê çûne Ewropayê hindik bûn, lê wan Xwendekarên Kurd ên Ewropayê bi navê (KSSE) komel ava kirin. Komela KSSE ku demeke dirêj kar dikir, jiber nakokî û ne li hevkirinên PDK-YNKê yên li Başûrê Kurdistanê bandor li parçebûnê kir û her ku çû sist û bêfonksîyonel ma.

Di sala 1965an de rêexistina bi navê HEVRA ku bi giranî ji alîyê Kurdêن Bakûr ve hat avakirin û rojnameya ku bi navê RONAHÎ derdixist, ji bo belavkirina hismendîya netewî di nav Kurdêن derveyî welat, bi taybetî li Almanyayê de, gelek hewl da û bi serket.

KOMKAR, bi alîkarîya xwendekar û karkerêن Kurd ên ku bi HEVRAyê re tevdigerîyan hat avakirin. Gelek rewşenbîr û xwendekarêن ku di xebatên HEVRA de cîh girtin, li Ewropayê, bi taybetî jî li Almanya pêşengîya xebata Partîya me jî kirin.

Di salêن 1960î de ji Tirkîyeyê berbi Ewropayê koçberyeyeke mezin a karkeran despêkir.

Di nav kesên hatin Ewropayê de Kurd jî hebûn. Karkerên Kurd ên ku bi kedkarên Tirk ra hatibûn Ewropayê demekî şunda ji bo mafêن xwe têdikoşîyan, ji destpêka salêن 1970yî ve dest bi avakirina komeleyêن cuda kirin.

Komeleyêن Kurd yên ku li gelek bajarêن Almanya hatin avakirin û di sala 1979an de li bajarê Frankfurt a Almanyayê hatin cem hev û Federasyona Komeleyêن Karkerên Kurdistanê, ku navê wê yê kurt KOMKAR e, ava kirin. Di KOMKARê da ne tenê xebatkar, rewşenbîr û xwendekar jî têda cîh girtin.

Komkar, di demeke kin de li gelek bajarên Almanya hat organîzekirin û bû rêexistineke ku ji aliyê raya giştî û sazîyêن fermî yên dewletê ve hate naskirin.

KOMKAR, bi taybetî li Almanya, Fransa, Îngilîstan, Hollanda, Danîmarka, Swîsre, Swêd û Avusturya li gelek welatan hat organîzekirin, Komeleyên KOMKARê yên ku bi navêna cuda li welatên Ewropayê hatinbûn avakirin, hatin bal hev û wek sîwanek di bin navê KOMKAR-EU de rêxistinekî yekgirtî ava kirin.

KOMKAR, kar û xebatêna xwe li Ewropa di du warêna sereke de meşand û dimeşîne.

Yek ji van kar û xebatêna bê cudahî piştgirîkirina têkoşîna rizgarîya netewî ya li Kurdistanê ye.

Duyemîn jî têkoşîna ji bo qebûlkirina nasnameya neteweyî ya Kurdêna li Ewropayê dijîn û naskirina mafêna wan ên ku ji koçberiyê peyda dibin.

KOMKARan, bi rêxistin û sazîyen din ên demokratîk li dervayî welat, li dijê rejîma faşîst a 12ê Îlonê, kar û xebatêna hêja kirin. Gelek çalakîyên rengîn û cuda pêkanî û hovîyên dijî mirovahî yên rejîma faşîst raxist ber çavêna raya giştî ya welatêna Ewropa. Bi hêzên demokratîk û aştîwazêna kêm netewêna din re bi sedan çalakî wek civîn, panel, konferans meş û xwepêñîşandan li darxistin, dest bi grevêna birçîbûnê kirin.

Piştî cunta leşkerî a faşîst, Kurdêna welatparêza û kadroyêna hêja neçar man ji ber zilm û zordarîyêna rejîma faşîst a 12ê Îlonê û ji ber şerê qirêj û gemar li Kurdistanê dihatin meşandin, hatin Ewropayê.

Li Ewropayê, bi tevlîbûna van kadroyêna siyasî û welatparêzan hêz û bandora KOMKARê jî gav bi gav zêde bû.

KOMKARê ji bo mafêna neteweyî û civakî yên Kurdan li Ewropayê têkoşîneke bêhempa meşand û kedeke mezin da. Ji bo rakirina qedexe danîna li ser navêna Kurdî ji bo zarokêna ku li derveyî welat ji dayik bûne, xebitî. Di encama çalekî û kampanyayêna ku KOMKARê di vî warî de pêk anî, ew qedexe hat rakirin. Ger îro zarokêna Kurd li gelek bajarêna Almanyayê Kurdî dixwînin û pênasâna xwe diparêzin bêguman di vê serkeftin û berxwedanê de, ked û para herî mezin û şêrane ya KOMKARê ye.

KOMKAR li dervayê welat li hemû welatêna Europa şahîyêna Cejna me ya neteweyî Newrozan bi awayekî coş û girseyî li darxist û li dardixe. KOMKAR, di vî warî de bûye pêşengê kevneşopîyêna pîroz yên gelê me.

KOMKARê, di warê çapemenî û weşanê da jî kar û xebatêna girîng û kêrhatî pêk anî.

Rojnameya Dengê KOMKAR, di Adara sala 1979an da dest bi weşana xwe kir û heta Sibata 1991ê, bi serhev 129 hejmar bi Kurdî û Tirkî çap kir, nûçeyêna di derbarê Kurdêna li Kurdistanê, Tirkîyê û Ewropayê û herwiha gotar û lêkolînêna kêrhatî li ser ziman, çand û hunera Kurdî hatin weşandin. Helbest û çîrokêna Kurdî jî di rupelêna rojnamê da cîh girtin û hatin weşandin.

Weşanxaneya KOMKARê bi dehan pirtûk û broşoran bi zimanê Almanî, Kurdî û Tirkî çapkir û belavkir KOMKARê bi vê xebata xwe ya giranbiha weşangerîya Kurdî li derveyî welat dewlemend kir.

KOMKAR-Swêd bi taybetî di warê ziman, çand û çapemenîya Kurdî de xebatêna hêja û serkeftî pêkanî. Bi navê Roja Nû rojnameyeke mehane ya Kurdî û Tirkî derdixist.

43 hejmarêna Roja Nû hatin weşandin û hejmara yekem di Kanûna 1978an de bi Kurdî û Tirkî derket. Roja Nû ku ji sala 1983an û vir de jî wek kovareke çand, huner û wêjeyê bi zimanê Kurdî derdiket û heta roja îro xwe gîhande 100 hejmaran.

Ji bilî kovara Roja Nû, bi navê Weşanên Roja Nû, bi dehan pirtûkên li ser ziman, çand û dîroka kurdî ku klasîkên edebîyata Kurdî hatin weşandin û kedeka girîng û kîrhatî ji bo pêşxistina çanda, ziman û hunera Kurdî da.

Endam û alîgirêne PSKê ne tenê di rêxistinê demokratîk û karkeran ên li derveyê welat de, cîh girtin, di heman demê de pêşengiya rêxistinkirina jin û ciwanên Kurd jî kirin. Yekîtiya Jinêne Kurdistanê (KOMJIN) û Yekîtiya Ciwanêne Kurdistanê (KOMCIWAN) ku iro jî hebûna xwe didomînin û xebatêne xwe berdevam dikin, bêguman van berhemêne hêja di encama kar û xebatêne êndam û hevalbendêne PSKê hatin avakirin.

Rêxistina KOMJINê di sala 1986an de hat damezrandin. KOMJINê ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan û bi taybetî jinêne Kurd ên li derveyê welat dijîn hat avakirin. Bi vê armancê ji bo perwerdeya siyâsi ya jinêne Kurd seminer, civîn, konferansan li darxist. Pêşangeh û çalakîyen çandî pêkanî, bêşdarê konferans û mîhrîcanêne navneteweyî bû û pirsgirêkên jinêne Kurd di rojevê da girt û şîrove kir.

Li gel van kar û xebatan KOMJINê, bi navê Jîyan kovareka jinan derxist û kovar 35 hejmar hatine weşandin. Kovara Jîyan, di rûpelên xwe de gotarêne ku pirsgirêkên jinêne Kurd bi taybetî jinêne dîasporayê rû bi rû ne û çareserîyen wan dinirxand û xizmeta çand û zimanê Kurdî kir.

Rêxistina ciwanêne Kurd KOMCIWAN jî wek KOMJINê kar û xebatêne bi wî rengî, ji bo ciwanan pêkanî. Di nav ciwanan de ji bo belavbûn û bilindbûna hestê neteweyî, ji bo di nav ciwanan de doza Kurdistanê zindî bimîne û di nav nifşen nûh da belavbe û her weha ji bo hînbûna ziman û çanda Kurdî çalakîyan amade kirin, semîner, konferans û festîvalan li darxistin.

Li Almanyayê KOMCIWAN di rêvebirina Federasyona Rêxistina Ciwanan a Alman (Deutsche Jugend Organization) da cîh digire. Di nav wê rêxistinê de gelek rêxistinêne ciwanêne Alman û biyanî cîh digirin. Herwisa di nav Konfederasyona Ciwanêne Alman (Deutsche Jugend Ring) de cig digire ku ev rêxistin sîwana hemû rêxistin û federasyonan e.

Piştî derbeya faşîst a 12ê Îlonê hinek endam û qadroyê me ji ber zûlm û zordarîya dewleta Tirk neçar man, wek koçber û penaber derketin dervayî welat. Bi hatina van endam û qadroyan kar û xebata Partiyê jî li dervayê welat hîn jî geştir bû. Rêxistina PSKê ya derveyî welat li alîyekî ve ji bo birêxistinkirina kedkar, jin û ciwanêne Kurd di qada demokratîk de ket nav hewildanê, ji aliyê din ve jî, ji bo rûreşkirin û şermezarkirina rejîma faşîst a 12ê Îlonê li derveyê welat xebatêne giranbiha pêkanî.

Rêxistina me ya Derveyî Welat, di vî warî de jî du xebatêne girîng pêkanî. Ya yekem Rapora Mafêne Mirovan li Kurdistanê û li Tirkîye bû, ku bi awayekî perîyodîk ji alîyê Buroya Têkilîyen Derva, ya Komîteya Navendî ya PSKê ve dihat weşandin. Rapora ku bi zimanê İngilîzî û Elmanî dihatin amadekirin ku bi giranî naveroka wê da binpêkirinêne mafêne mirovan, zûlm û zextêne dewleta Tirk yên li Bakûr Kurdistanê li ser gelê me dihatin kirin berhev dikir û dikirin rapor. Ev Rapor ji bo sazî û rêxistinêne navneteweyî bi taybetî NY û YE re dihatin şandin.

Kar û xebateke din a gelekî girîng jî li darxistina konferansa navneteweyî ya bi navê "Mafê Mirov li Kurdistanê" ye ku ji hêla Însiyatîfa Mafêne Mirovan a Kurdistanê ve hat organîzekirin. Nêzîkî 200 sîyasetmedar, hiqûqnas, zanyar, lêkolîner, nivîskar û rojnamevanêne navûdeng û payebilind ên ji 16 welatêne (Ewropa Rojava, Amerîka û Awustralya) beşdarê konferansê bûn. Ev Konferans di 14-16ê

meha Nîsana sala 1989an de li Almanya li bajarê Bremenê di bin hîmaya Serokê Parlamento ya Bremenê da hat lidarxistin.

Di encama nîqaşen ku di konferansê de hatin kirin bi navê “Deklarasyona Bremenê ya Mafêni Mirovan li Kurdistanê “hat weşandin ku îro jî daxwazên wê deklarasyonê guncav in. Di daxuyanîyê de daxwazên bingehîn ên gelê Kurd, hatin destnîşankirin. Sazî û rôexistinê navneteweyî yên têkildar hatin vexwendin ku bi hestyar tevbigerin û ji Rêxistina Neteweyê Yekbûyî hate xwestin ku, “Di çarçoveya rêgezên qanûnî de bi lezgînî rewşa gelê Kurd hilde rojeva xwe û li gor hiqûqa navneteweyî, ligel prensîbên wekhevîya mafêni gelan û mafê destnîşana çarenûsa xwe bi awayekî azad gelê kurd jî karibe wî mafî bi kar bîne”.

Însiyatîfa Mafêni Mirovan a Kurdistanê ku gelek raporêni li ser binpêkirinê mafan li Kurdistanê amade kir û bêşdaîya gelek civîn û konferansên mafêni mirovan kir, binpê kirinê mafê mîrovan li Kurdistanê radixist ber çavan di sala 1991an de li bajarê Bonnê konferanseke navneteweyî li darxist. Konferansa ku li Bonnê hat li darxistin wek berdewamîya Konferansa Bremenê hat lidarxistin û ji gelek welatan siyasetmedar, parêzer û parêzvanê mafêni mirovan yên navdar bêşdar bûn. Amadekarêwan civîn û konferansên ku hatin lidarxistin Komeleya Mafêni Mirovan a Navneteweyî ya Kurdistanê (IMK) bû.

IMKê, li ser binpêkirina mafêni mirovan li Kurdistanê gelek lêkolînên girîng kir. Konferans, seminer û civîn çekirin û di konferansên ku têde besdar dibû wek parêzvanê mafêni mirovan û zext û zordarîya dewleta Tirk a li ser gelê Kurd eşkere dikir û raya giştî ya navneteweyî agadar dikir.

### Pêvajoya Fermîbûnê

Wek me li jor jî anî ziman; îlegalîte ne tercih û daxwazîya Partîya me bû.

PSK, ji ber şert û mercên serdema ku tê de ava bû, ji neçarî wek illegal hat damezrandin. Lê ji bo ku partîya me, bi nav û bernama xwe bi avayekî fermî û legal di qada sîyasî de kar û xebatên xwe bidomîne ev mijar her tim di rojeva me da bû, û ji bo wê jî me têkoşîn da.

Di kongrênuji sala 1995an şünde hatin li darxistin de mijara legalîyê zêdetir di rojeva me de cîh girt.

Di wan kongran de encama gengeşî û nirxandinan de hat destnîşankirin ku ji bo legalîtê şert û merc ne guncaw bûn. Di encama wan nirxandinan dîsa biryara berdewamîya wek illegalê hat dayin.

Kongreya me ya 10an di sala 2014an de pêk hat. Di vê kongrê de mijara sereke û bingehîn evbû ku Partî xwe legalîze û eşkere bike. Piştî nîqaşen dûr û dirêj ev mijar bi pirdengî dawî lêhat. Li gor biryara kongrê, PSK, ji vir û şunde bi navê Partîya Sosyalîsta a Kurdistan PSK, kar û xebatên xwe legal û wek fermî bi rêve bibe. Ev mijar bi vî rengî û erêkirina endamên kongrê dawî bû.

Di wan demêni bihorî de li Tirkîyê û herêmê guhrînên balkêş û pir girîng derketibûn pêş. Tirkîyê pêvajoya ji bo endamîya Yêkîtiya Ewropayê dabû destpêkirin. Di mijara demokrasîyê de hîn gavênerênî dihatin avêtin. Di çarçoveya pirsgirêka Kurd de pêvajoyeke çareseriyê destpê kiribû. Bi PKKê re mijara bêdeng kirin û seknandina çekan di rojevê da bûn. Pêvendîyê Tirkîyê û Hikûmeta Başûrê Kurdistanê bi awayekî erênî dimeşîyan.

Di nîqaşen berîya kongreyê û di dema kongreyê de li ser van guhartinan lihevkrineke giştî derket holê. Di bin ronahiya hemû nîqaş û danûstandinan de, di encama dengdana ku di kongreya 10an da derket û biryar hat dayîn ku PSK, were legal kirin û di qada sîyasî de wek fermi were bi rêvebirin. Kongreya me ya 10an ji bo kar û barên legalîya fermî nexşerîyek destnîşan kir û Komîteya Navendî (KN) ya di kongreyê de hat hilbijartin, ji bo vî karî hat wezîfedar kirin.

Komîteya Navendî ya PSKê li gor nexşrêya ku di Kongreya 10an de hatibû destnîşan kirin di 30ê Gulana 2016an de damezrandina PSKê ya bi fermî bi cîh anî.

Ji roja 30ê Gulana 2016an ji bo Partîya me serdemeka nû û cuda dest pêkir.

Partîya me piştî ku li gor zagonên Tirkîyê bi fermi hat pêjrandin, kar û xebatên xwe li ser esasê têgîştana prensibên xwe dimeşîne, pênasâ xwe ya Kurdistanîyi diparêze. Îsrara me çareserîya aştîyane ya pirsgirêka Kurd û girîngiya ku em didin têkoşîna demokratîk û xebatên civaka sivîl, her ku diçe zêde û rengîntir dibe.

PSK baş zane kû Bakûrê Kurdistanê ji pêkhatîyên pir rengî û pir dengî pêk hatîye. Em baş zanin çareserîya pirsgirêka Kurd, rol û girîngîya sereke, hevkarî û têkoşîna hevpar a hêzên welatparêzên Kurd ve girêdayîye. PSK bi vê hîzr û bawerîyê heta ji dest hatîye tevgerîyaye.

Xebata me ya ku bi navê “ 5 Qilî, 4 Qolî, 3 Qoli” tê nasîn, di van 8 salên dawî de ji bo pêkanîna hevkariyeke berfireh bi partî, rêtixtin û pêkhateyên siyasî yên Kurdistanê ra, heta niha encameke mayînde nedabe jî, lê em di wê bawerîyê da ne ku zemîneke erênî ji bo pêşerojê amade kirîye.

Naskirina zimanê û nasnameya kurdî, temînkirina garantîya perwedeya bi zimanê Kurdî di destûra bingehîn de, paşvekişandina helwesta li ser pirsgirêka Kurd di peymanên navneteweyî yên ku ji alîyê Komara Tirkîyê ve hatine îmzikirin, destnîşan kirina cihê gorêne rêberên Kurd yên ku hatibûn îdamkirin, vegerandina navên Kurdî yên ku wergerandine Tirkî û hwd. daxwazên demokratîk û armanca hevpar a hemû partî û pêkhateyên Bakurê Kurdistanê ye. Partîya me ji bo cih bi cih bûna van daxwazan di asta herî bilind de ji bo pêkanîna yêkîtî û hevkarîya hêzên welatparêz xwedî helwestekî bi biryar û dil û cane.

PSKê, di van heşt salên dawî yên pêvajoya legal a fermî de, di hilbijartinên herêmî û giştî yên li Tirkîyê de cîh girt. Di van hilbijarinên giştî û herêmî de hêla xwe li bal hêzên demokrasî û guhertinê destnîşan kir.

Di hilbijartinên herêmî yên sala 2019an de bi PAKê re hevkarîyekî pêkanî, bi derxistina namzetên serbixe wê qada hilbijartinê ji bo bihêzkirin û belabûna daxwazên netewî yên demokratîk bi kar anî.

PSK, bi berpirsiyârîya neteweyî û helwesta xwe ya çêker li hemberî parçeyên din ên welatê me berdewam e û bi rêtixtinên siyasî yên van beşan re têkiliyên xwe yên germ û dilsozane didomîne.

PSKê bi tevî rêtixtinên din ên Kurdistanî ji bo piştîvanîya Referandûma Serxwebûna Kurdistanê ku di 25ê Îlona sala 2017an de hat lidarxistin komîteyeke piştevanîyê ava kir. Komîteyê li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê ji bo nasandina helwesta referandumê û peydakirina piştgiriyê, civînan li darxist, konferans amade kirin û serdana partîyên siyasî û rêtixtinên girseyî yên demokratîk ên bi bandor kir.

PSKê li hemberê hemî pêşketin û rudawên siyasî û civakî yên ku li Kurdistan û Tirkîyeyê hatin holê helwesta xwe diyar kir, bi raya giştî re parvekir û însîyatîfîn pêwîst girt.

PSKê, carna bi tena serê xwe, carna jî bi bi hêz û alîyên din ên welatparêzên Kurdistanî re Cejna Netewî Newroz pîroz kir û besarê bîranîna Cangorî û Şehîdan, Komkujîya Helebceyê û avakirina Komara Kurdistan, ku di sala 1946an de bi pêşengîya Pêşrewa Qadî Muhamed hatibû demarzandin şevê bîranîne li darxist û herwah sedemê roja Aştîya Cîhanê meş û çalakî pêkanî.

Karwanê Rêya Azadîyê di sala 1974an şeva ku bi sala 1975an ve hat girêdan bi rê ket.

Vî karwanî ji rîyekî dûr û dirêj, di kemîn û davikan de derbas bû, bi tevî gelek astengan bi ketin û rabûn, bi serketin û daketinan ji rîyekî dûr û dirêj, gîhîst van rojan.

Ji niha û pêve jî, ji pozbilindîye dûr, lê bi biryar û bawerîyekî xurt, pêkhateya pir reng û pir dengîya civaka me jî li ber çav bigre û tevgera rizgarîya neteweyî wê mezin û bilintir bike.

PSK, bi coşeka mezin hêz û enerjîya xwe wê bigîhîne çemê ku, ber bi Azadiyê ve diherike bidomîne

PSK, di wê bawerîyê da ye ku wê bi têkoşîneki hevgirtî û têgihiştinekî neteweyî û hevpar em ê bîghîjin serkeftinê

PSK, wek hêzekî azadîxwaz, partîyekî demokratik û neteweyî, xwe dispêre ezmûn û mîrasa tekoşîna 200 salî ya gelê Kurd û herweha bi kelk vergirtina bayê navneteweyî, wê bi mîrxasî heta roja serkeftinê berxwe bide.

Sîyaseta me ya rast û realist, ked û fedakarîyên hevrê û hevalbendên me, yên wê wekî duh, îro û paşerojê da jî, ji bo me cîhê star û bawerîya herî mezin e.

Em, bi 50 saliya PSKê serfiraz û serbilindin.

Em li hêla rast û mafdar yê dîrokê ne.

Bê şik û guman emê bi serbikevin.

**Tebax 2024**